

Alice we dibe nav warêñ bi mucîze

» RÜPEL 9



Çand

Kanser sedema zû mirinê ye

» RÜPEL 8



Tendûristî

Versiyona çapkirî ya HAWAR NET.comê / Çapa Dijital / 27.03.2010

Hejmara 7

Rojnameya Kurdî a serbixwe

hawarnet.com / hawar.hk-mg.net/PESKETIN

agahi@hawarnet.com



İsraîl dixwaze
hevdîtinê aştiyê ji
nû ve destpêbikin

İsraîl di meseleya Qudisê de paşve
gav navêje. rûpel 6

Divê rexistinê kurd
hember terora Îranê
bikevin tevgerên

Ziyyiyeta ku Qazi Muhammed idam
kir niha jî neviyên wî idam dike...
rûpel 2

Li Frensayê çepgir serê Sarkozyê
diêşînin » r.2

Li şûna bersuc, ji meddûr C.E.
30 sal ceza tê xwestin » r.2

Belçika dev ji çewtîyê berda;
Aydar û Kartal serbest in » r.2

Ji ber skandalên seksê dêr vala
bûn... » r.2

Destê ku veqete dikare ji nû
ve derkeve! rûpela 09

Cîhan bi mîlyonan Kurdên li qadan nedît!



Amed di Newroza xwe de ji hemû cîhanê re got; Hesabêñ şâş nekin» r.3

- Serokê PJAK'ê jî hate girtin.
- Kurd bi hêrseke mezin
bêedeletiya Ewrûpayê
şermezar dikin..

Amed (Pêşketin): Li bakûrê Kurdistanê li gel hemû
astengiyên dewleta Tirk Kurdistanî bi coşke mezin
cejna neteweyî ya Kurdan Newrozê hate pîroz kirin. Li
hemû Kurdistanê ji her sal zêdetir beşdariya gel çêbû.
Ji roja 17ê heta 21ê zêdetirê 4 mîlyon Kurd li qadan bi
avayekî girseyî bi rengê neteweyî Newrozê pîroz kirin.
Li Diyarbekirê nézi 1,5 mîlyon kes hatin cem hev û tu
bûyer ji neqewimi. Organizasyonake ewqas mezin ji
aliyê raya giştî ya cîhanê ve nehate ditin. Di medyaya
cîhanê de di çend weşanan de bi avayekî bir kurt behsa
Newroza li Amedê û bi giştî li Kurdistanê hate kirin.
Nûçeyen ku derketi bûn ji tev agahiyên şâş hatibû
dayin û hejmar wek 100 hezar hatibû nişandan.
Dewama nûçe di rûpela 3'an de



Newroz bi coşke mezin hate pîroz kirin . 3

Obama serkeftina xwe ya pêşî bi dest xist » r.6

GOTAR
Li ser Yekîtiya
Tevgera Kurd
OSMAN SILIVANİ R5

TENDURISTI
Jin ji rexneyan
û jibîrbûnê hez
nakin R8

ÇAND
Pirtûka Arjen Arî
'Bihoka pişt sînor'
derket R8

ZANIST
Pevçûna jin û mîr
mirov nexwes
dike... R8

Naveroka Din
» Gotar r.5-6
» Zanist r.8
» Aktuel r.10
» Çand r.8

Terorizekirdina reprodukt,
resîvîlîzasyon û repolitîze
kirina civaka Kurd AZAD BIŞENG »
r.5

Ger dewleta Tirk serbest
kirina zimanê Kurdî de ji dil
be divê berê gavê din
bavêje
SERHAD B. RÊNAS » r.4

Dewleta kurdî di
peymanên
nêvdewletî da
B.S.SILÈVANEYÎ » r.4

Weşanên HKMG:
HAWAR NET hawarnet.com
MUZIKKURD muzikkurd.com
SİNEMAKURD sinemakurd.com
ZANISTUTEKNOLOJİ zanistuteknojli.com
KURDO kurdo.me | JINANE jinane.hk-mg.net
ABORINAS aborinas.hk-mg.net
HEMÜ www.hk-mg.net

Divê rexistinê kurd hember terora û Iranê bikevin tevgerê

Ziyniyeta ku Qazî Muhammed idam kir niha ji neviyên wî idam dike

AMED (Pêşketin)
Ev zêdeyi mehekê bû ku Zeynep Celaliyan ji aliyê hêzén rejimê ve bê ti sedem ú sebeb ji girtianeyê ji besa jinan ji bo ciyeji nediyar hatiye veguhesi bûn. Piştî şopandina parêzera wê derket holê ku Celaliyan di girtigeha Tehranê de ye. Tê diyar kirin ku Li ser Celaliyan ixtimala destdirêjiya cinsi ji heye. Her wiha anîna Celaliyan li girtigeha Tehranê ji wek zêde

bûna ixtimala idam kirina wê tê nirxandin. Her wiha 19 girtiyen siyasi ye kurd yén din ji bi cezayê idamê re rûbirû ne ú jiyana wan di talukê de ye. Rexistinê kurdan ku ji xeyni weşandina daxûyanîyan tiştek din nakin dîv bikevin tevgerê ú raya giştî ya nvanetweyi ji terora frânê a ser Kûrdan haydar bikin. Rejima hov a iranê zext ú êrişen xwe yén ser gelê Kurd a li rojhilatê Kûrdistanê her roj hineke din zêdetir dike. Dewleta iranê ku yek ji dagirkere Kûrdistanê ye bi idam û kuştin ú hewlén

asimilekar dixwaza bizava azadiyê ya Kûrdan bişkîne. Bi taybeti yek ji rêbazê terorê ya rejima û Iranê idam kirina ciwanê Kûrd e. Heta niha bi dehan Kurd ber celadêni rejima dagirkir jiyana xwe ji dest dan. Wisa xûya dike ku ger Kûrdên rojhilatê Kûrdistanê yekitiya pêk neynin ú hemû perçeyên Kûrdistanê ji bi avayeki eşkere di warêni diplomatik ú politik de hemberi dewleta û Iranê ranewestin êrişen û Iranê ji zêdetir bin.

Welatên rojava bêdengin
Li rojhilatê gellek Kûrd têne idam ú êşkence kirin. Welatên



rojava ku di her rewşê de dewleta û Iranê rexne dîkin terora ser kurdan tê meşandîn nabinin. Dûrûtiya welatên rojava di terora û Iranê ser kurdan de ji derdi keve hole.

Dewleta hov Fetahiyan idam kiri bû
Rejima dagirkir ya û Iranêberiya 20 rojan, tevi hemû bangan ji, li ber çavêni cihanê ciwanê Kûrd û İhsan Fetahiyan darve kiri bû. Ciwanê bi navê İhsan Fetahiyan ê ji Rojhilatê Kûrdistanê, 2008'an de li herêma Kamyaranê hatibû girtin. Di rûniştina doza wi ya ewil de, 10 sal ceza lê hat birrin, lê paşê dagdeha Sinê cezayê idamê lê birri. Tevi hemû bangan ji, rejima û Iranê ya qaşo

islami, li Girtigeha Navendî ya bajare Rojhilatê Sinê, saet 4'ê Sibê ciwanê Kûrd ê 19 sali idam kir. Fetahiyan beriya ceza pêk were, bi riya Saziya Malbatêni Girtiyan nameyek wêsandibû... Di nameyê de İhsan Fetahiyan weha digot: "Cezayê li diji min hatiye birin, siyasi ye ú li diji huquqê ye. Ne mirina min, ne ji mirina bi hezaran ciwanê Kûrd wê pirsgirêka Kûrd ji holê raneke."

HAWAR NET.com

Pevçûna YNK û Goranê di roja dawî de jî dewam kir

Di pevçûneke navbera aligirê listeyên başdari hilbijartinan de li Şarezûyê, 7 kes birindar bûn.

Rêveberê Giştî yê Saxlemeiya Silêmani Rêkewt Heme Emin j diyar kir, "Hejmara birindarê búyera seri li bajarê Şarezûyê gîhiştîye 7 kesan". Heme Emin got, "Niha rewşa saxlemeiya birindaran normal e". Pêşteşir Peyvârê Tevgera Goran Tofig gotibû, "Roja inê hejmarek çekdaren YNK êrisi aligirê Tevgera Goran yén bajarê Şarezûyê kirine ú di şer û pevçûneke navbera her du aliyan de hejmarek welati birindar bûne". AJAN SAN

Demîrtaş bersiva Erdogan da û got: 'Bila her kes hedê xwe bizanibe'

AMED (Pêşketin)
Serokwezirê Tirk Erdogan ji ber pirozbahiyê Newrozê érisi nirkhên gelê kurd kir. Hevserokê BDP'ê Selahattin Demîrtaş ji dî axaftina xwe ya ji bo koma partiye de bersiva Erdogan da û got: 'Bila her kes hedê xwe bizanibe' Hevserokê BDP'ê Selahattin Demîrtaş xwest ku hikûmet peyamêni ji Newrozê derketine baş fêm bike ú wiha got: "Bi milyonan kes muxatabêni xwe yén rastin

nîşan dane. Heke ku ew Ocalan û PKK'ê nebînin, dê bi bin palpişte de biminin ú biqedin. Ew van çalakîyen me weki 'xwepêşandanen qirêj' bi na dîkin. Em vê yekê qebûl nakin. Tu kes ne xwedî maf e ku li milyonan heqaretê bike." Erdogan ci gotibû? Serokwezirê Dewleta Tirk Recep Tayyip Erdogan di axaftina xwe ya ji bo koma partiya xwe de bi zimanekî

bêrêz pirozbahiyê Newrozê yén ku zêdetirî 4 milyon kes tevli bûn nirxandin ú wiha got: "Hin axaftinê ku hedê xwe borandin hatin kirin, slogan hatin berzikirin, pankart ú wêne hatin vekirin. Pêşandanen sinevizyonê hatin kirin. Me destûr da van tiştan. Lî van bandor li ser pirozbahiyê tevâhiya welat nekir. Di Newrozê pêş de hêviya min ew e ku kesen ji bo vê wesayetê bûne alet xwe ji vê wesayetê rizgar bikin." AJAN SAN



Li şûna bersuc, ji mexdûr C.E. 30 sal ceza tê xwestin



Ji zarokê 17 sali C.E., yê di Newroza sala 2008'an de li ber kamerayan destê wî hate şikandin re ji 4 dozêni cuda 30 sal cezayê hepsê hate xwestin..

AMED (Pêşketin)
Di 22'ê adara sala 2008'an de ji ber ku DTP'ê xwest Newrozê piroz bike ú rayedaren dewletê destûr nedan, li Colemérge bûyer derketin ú polisan di bûyerê de li ber kamerayan destê C.E'yê 17 sali şikandin. Piştî bûyerê ligel 3 sal di ser bûyerê re derbas bûn, lepirsina derbarê polisan

de vebû bi encam nebû. Lépirsina hat destpêkirin ji, bêencam ma. Piştî bûyerê malbata C.E., derbarê polisan de lepirsina vekirin. Lé lepirsina hate vekirin ji bi bêşopandinê bi encam bû. Li aliyê din derbarê C.E de 4 dozêni cuda hatin vekirin. Dozgerê Komarê yê Colemérge derbarê C.E. de li Dadgeha Sulh Ceza ya Colemérge bi idia ya Muxalefetiya meş ú

xwepêşandanen kiriye", Neheqi li kesayetiya manevi ya Ataturk kiriye", "Zirar daye heykelê Ataturk" ú "Propaganda réxistinê kiriye" 4 dozêni cuda vekir ú bi tevâhi 30 sal ceza xwest. Piştî 4 dozêni cuda li C.E. hatin vekirin, C.E., dê di 25'ê adare de derkevê pêşberê dagder. Parêzêre C.E. Fahri Timur, bertek nişanî dozêni hatine vekirin da ú diyar kir ku darazek adilane pêk nayê. Timûr, ani ziman ku dê di pêşerojê de seri li Dadgeha Mafêni Mirovan a Ewropayê (DMME) yê bide. AJAN SAN

Terora dewleta Sûriye li Reqqayê dewam dike

Di Newrozê Sûriye de ji ber êrişen dewleta Sûriye yek jê zarok 3 kesan jiyana xwe ji dest dan. Kûrdên rojava ji bûyer û encamên Newrozê dewleta Sûriye tawanbar dibinîn û banga yekityê kirin.

AMED (Pêşketin)

bajare Reqqayê disa hêzén ewlekariya Sûri dest binçavkirina Kûrdan kir. Di belavokê de tê gotin: "Çavkaniyen me tekez kirin, komek ji girtyen roja Newrozê hatin şandin bo Dadgeha Leşkeri ya Reqqayê bi tevana handana şerê navxweyi ú lêdana karmendêni dewletê, 4 jê temenê wan ji 18 saliye kîmtir e, Hersê réxistin daxwazén xwe wiha xuya dîkin :

"Azadkirina her sê kesen ku temenê wan ji 18 saliye kîmtir e, ú girtina dosiyeya wan - Azadkirina hemû girtyen li ba Beşen Ewlekariye ú girtina dosiyeya wan - Rêdana kesûkarên birindaran bo serîledanê ú zanina rewşa wan a tendirusti - Spartina leşe Mihemed Heyder yê 14 sali ku jiyana xwe ji dest da bo xwediyyen wî ta veşerîn li gor neratan û cerebûkirina xwediyyen wî". HAWAR NET.com

Belçîka dev ji çewtiyê berda; Aydar û Kartal serbest in

HEWLÉR (Pêşketin)

Siyasetmedarên kurd Zubeyir Aydar û Remzi Kartal û 8 kesen din ku li Belçîkayê bi gumana endamîya Partiya Karkeren Kurdistan PKK'ê de hatibûn girtin, serbest hatin berdan. Li

gorî malpera ANF'ê, biryara berdانا her yek ji Serokê Kongra - Gel Ramzi Kartal û Serokê Kongra - Gel yê berê Zubeyir û 8 kesen din ku di 4'ê Adara sala 2010'an de li Belçîkayê hatibûn girtin, iro ji hêla dagdeha Belçîkayê

ve bi şert hatiye dan. Malpera han wiha berdewam kiriye, "Her cend biryara berdانا wan ji hêla dagdehê ve hatiye dan, lê cardin dagdehê mafê vê yekê heye ku itirazê bike ú dosyeya wan bisopine". AJAN SAN

Li Amedê qampanyaya "Em gora rêberên xwe dixwazin"

Koma Diyalogê ya Dicle Fîratê, bi boneya cihê gorên rêberên kurd aşkera bikin qampanyaya "Em gorên rêberên xwe dixwazin" da dest pêkirin

AMED (Pêşketin)
Koma Diyalogê ya Dicle Fîratê, bi minasebeta salvegera vefata Saidi Nûrsi li ber Mizgerfta Ulu ya Amedê daxuyanî da çapemeniyê. Di daxuyanîya gelek kes amade bûn de, wêneyên Bediuzzaman Saidi Kurdi, Şeyh Said û Seyit Riza hatin

hilgirtin. Komê pankarta "Em cihê gorên bapirên xwe dixwazin" vekirin û li ser navê komê Muhittin Batmanli daxuyanî xwed. Batmanli diyar kir ku gotinê Saidi Kurdi baş nehatin femkirin ú wiha got: "Di nivisên Kurdi de têkildari herêmê, kurdan û Kurdistanê de gel raman anine ziman. HAWAR NET.com

Batmanli bang li hikmetê û Serokomar ji kir ú wiha pêde çû: "Em gora Bediuzzaman Saidi Kurdi, Şeyh Sait, Seyit Riza, Salih Bege û gorên din yên rêberên xwe û bapirên xwe dixwazin." Batmanli ani ziman ku ji bo gorên rêberên kurdan bêni ditin qampanyaya "Em gora bapir û rêberên xwe dixwazin" dane dest pêkirin.. HAWAR NET.com

Demîrtaş: Em di warê fîlî de derbasî xweseriye dibin

BDP, di çarçoveya ji bo pêşketina têgehê "Şaredarvanya demokratik û ekolojik" pêşkeve merasima vekirina akademiyê pêk anî. Di merasima vekirinê de Hevserokê BDP'ê Selahattin Demîrtaş, diyar kir ku BDP'ê biryaren xwe yên rêberîya herêmî bi gel re distinenin ú wiha got: "Komara Tîrkiyeyê di fermiyetê de li gel şertê Xweseriye Demokratik û Xweseriye Rêveberîyê Herêmî yên Ewropayê erê nekiriye ji, em di warê fîlî de xweseriye demokratik dijin.

Cîhan bi mîlyonan Kurdên li qadan nedît!...

Li Ewrûpayê meşeke normal di BBC an ji CNN de dibe manşet. Lê 4,5 mîlyon Kurd nehate ditin.

D.BEKIR (Pêşketin)

Li bakûrê Kurdistanê li gel hemû astengiyen dewleta Tirk. Kurdistanî bi coşke mezin cejna neteweyi ya Kurdan Newrozê hate piroz kîrin. Li hemû Kurdistanê ji her sal zedeitir besdariya gel çebû. Ji roja 17ê heta 21ê zedetirê 4 mîlyon Kurd li qadan bi avayekî girseyî bi rengê neteweyi Newrozê piroz kîrin.

Li Diyarbekirê nezî 1,5 mîlyon kes hatin cem hev ú tu bûyer ji neqewimi. Organizasyonake ewqas mezin ji aliye raya giştî ya cihanê ve nehate ditin. Di medyaya cihanê de di çend weşanan de bi avayekî bir kurt behsa Newroza li Amedê ú bi giştî li Kurdistanê hate kîrin. Nûçeyen ku derketi bûn ji tev agahiyen şâş hatibû dayin ú hejmar wek 100 hezar hatibû nişandan. Di medyaya cihanê de çalakiyên ku 50 hezar kes têne cem hev ji manşet tê dayin, teqineke biçük



Li Ewrûpayê meşeke normal di BBC an ji CNN de dibe manşet. Lê 4,5 mîlyon Kurd nehate ditin. Kurd Newrozê wek cejneke netweyi piroz dîkin.

Li gellek cihan cosa Newrozê

Di seri de ú di nava rewşeye aram de, li Hewlêra paytext bi besdariya xelkê, rayedaran ú nûnerên gelek welatên biyani agirê Newrozê li parka Şaneder hat hilkirin ú ahenga sersala Kurdi ú Newrozê dest pê kir. Herwiha Silêmaniyê ú navçeyen girêdayê wi ji agirê Newrozê hilkirin, herwiha li Duhokê ji bi

besdariya çend peraşotvanen Norwêji ev cejin hat pirozkirin. Li bajarê kerkûkê ji bi xweşiyek mezin ve sersala Kurdan hat biranin. Li Stenbolê, di pirozbahiya newrozê de ya ku ji aliye Platforma Çareseriya Demokratik a ji bo Aştiyê hatiye organizekirin de, di diroka Stenbolê de cara péşin e ku bi sed hezaran kes li qada Kazlıçeşmeyê dibejin biji Ocalan. Di pirozbahiye Newroz ê ku li qada Kazlıçeşmeyê ya Zeytinbûrniyê tê pirozkirin de zêdeyi 500 hezar kes besdar dibin. Kurdistanîyen koçmal besdari ve şâhiyê dibin, şâhê werdigerin şâhiya girêdana bi Ocalan re. Li ser wan platformen mezin nivisên

an ji ketina balafireke di hemû weşanan de cih digre. Li Ewrûpayê meşeke normal di BBC an ji CNN de dibe manşet. Lê 4,5 mîlyon Kurd nehate ditin. Kurd Newrozê wek cejneke netweyi piroz dîkin. 4,5 mîlyon Kurd di weleteke hatiye dagir kîrin de derketin qadan ú daxwazên xwe yén rewa qiriyan. Lê raya giştî ú medyaya cihanê çalakiyekî wisa wek bûyereke ji réze dît. hewlweta medyaya Tirkî jixwe diyar e ú tê fam kîrin, jixwe diji hebûn ú bîhêz bûna kurdan in.

Lê vê helwesta medyaya cihanê nişan dide helwesta wan ên hember Kurdan ne kîmi dagirkeren Kurdistanê ne.

Helbet di vê rewşê de berpirsyariya Kurdan ji heye. Organizatorên Newrozê divê careke din bifikirin ku gelo çîma raya giştî de Newroz deng veneda. Kémasi çine ^:u çawa di Newrozêne de Kurd dikarin bala medyaya cihanê bikşinin. HAWAR NET.com



Wêneyen şehîdan hatin daliqandin

Wer wiha ji Navçeya Bismilê ji bi boneya besdari Newroza Amedê bibin bi sedan kes li trenê siwar bûn ú berê xwe dan Amedê. Bi sedan wesayitên ku ber bi qada Newrozê ve diherikin, ji niha de Riya Rihayê li trafikê xetimandin. Qada Newrozê ji niha de bi deh hezaran tiji bû. Li pêşîya dika Newrozê posterên Ceylan Onkol, Aydin Erdem, Ebu Muslim Dogan, Aram Tigran, siyasetmedarên kurd Cihan Deniz ú Husnu Ablay én mezin hatin daliqandin.

Amed di Newroza xwe de ji hemû cihanê re got; Hesabêş şâş nekin

Diyarbekir ku her sal dibe paytexta Newrozê iro pêşwazîya Newroza dirokî û herî mezin kir

Cara yekem tevli bûna xelk mîlyoneke derbas kir.

Diyarbekir ku her sal dibe paytexta Newrozê iro pêşwazîya Newroza dirokî û herî mezin kir. Amed bi helwesta xwe isal listik û hesabêş ser gelê Kurd bersivek tund da.

Her wiha iro di gelek bajarên din ên Kurdistanê de ji pirozbahiye Newrozê hatin pêkanîn.

Amed got; "ez li vir im"

Ji serê sibê ve bi sed hezaran kesen ku ji 4 aliye bajêr ketin rê, ber bi qada Newrozê ve herikin. Bi hezaran kes ji bili wesaiten ku ji aliye Komiteya Amadekar a Newrozê ve hatin amadekirin, bi derfetên xwe bi motorsiklet, kamyonetan berê xwe dan qada Newrozê. Ji saeten bibehe ve bi organizasyona Komiteya Amadekar ji gelek noqteyên bajêr bi otobüsên şaredariyê welati diçin qada Newrozê. Bi 10 hezaran kes bi meşê çûn qadê.

Welatiyên ku alén BDP'e filamayen kesk, sor û zer rakirin, bi cilên xwe yén neteweyi balê kişanîn.

Di pirozbahiya Newrozê ya Diyarbekirê de Ciwan Haco, Serhado, Bülent Turan ú Ferhat Tunç konserê dan. Di pirozbahiya Amedê de bi teví silkulyasona girseyê ku çûyin ú hatin her dewam dikir nézi mîlyonek ú 400 hezar kes başdar bûn.

Leyla Zana ú serokê şaredariya Amedê Osman Baydemir, Ahmet Turk, Hevsîroka KCD, berdevka komên aştîyê di pirozbahiye Newroza Amedê de axîvin.

Berî pirozbahiye, Şaredarê Bajare Mezin ê Diyarbekirê Osman Baydemir axivî ú got, "Careke di zelai bû ku heram e ku kurd çekan bera tirkân, tirk çekan bera kurdan bidin. Edî dem hatiye ku em qurnefilan bidine destê hev. Wext e, ku dayikên kurd ú tirk hev hembez bikin. Gelek wext çû, şerm e, guneh e." Newroza Amedê ku bi mîlyonan kes anin cem hev, isal malovaniya gelek mîvanen biyani ji kir.. Ji bo dewama nûçeyê HAWAR NET.com

Gelê Kurd li çar aliye Kurdistanê ji bo Newrozê rabûn



AMED (Pêşketin)

Kurdistanîsîl Newrozê bi avayê heri girseyî piroz kîrin. Dewletenê dagirker tehemmilli li cosa mezin gel nekîrin ú dewleta dagirker a Sûriye li Reqayê 2

Kurd qetî kîrin. Li bakûrê Kurdistanê li gel hemû astengiyen dewleta Tirk

Kurdistanîbi coşke mezin cejna

neteweyi ya Kurdan Newrozê hate piroz kîrin. Doh ji bo Amed ú ji bo hemû kurdan rojekê dirokî bû. Cara yekem tevli bûna xelk mîlyoneke derbas kir. Ji xeyni Amedê ji li bajarên din ji newroz bi avayekî pir xûr hate piroz kîrin. HAWAR NET.com

bakûrê kurdistanê ú li Tirkîye çalakiyên newrozê dewam kîrin. Li rojhîlata kurdistanê ji cejna Newrozê cara pirozkirin. Li Kurdistanâ azad ji Newroz isal bi avayê seyranê hate piroz kîrin. HAWAR NET.com

Herêma Botan li qadan bû

Li navçeyen Erûh, Kercos ú li bajarokê Sitilîlê hate pirozkirin. Di newroza 2010an de gelek tişten nû pêkhatin. Li gelek deveran cejna Newrozê cara yekem bû ku bi girseyî hate pirozkirin.

Li navçeya Sûrt Erûhê, navçeya Batman Kercosé ú li bajarokê navçeya Mérden Nisêbin Sitilîlê cejna Newrozê bi coşke mezin hate pirozkirin. Navçeya Sûrt Erûhê ku di tekoşina gelê Kurd de cihêkî wê yê giring heye iro agirê Newrozê pêxist. Pirozbahiya ku bi hezaran kes tevli bûn zêdebûna jinan bal kişand. Parlementerê BDP'ê yê Sûrt Osman Ozçelik Şaredarê Erûhê Melihan Oktay ú Şaredarê Sûrt Selim Sadak ji di mitingê de herkê axaftinek kîrin. Osman Ozçelik axaftina pêsi kîr ú got agirê tekoşîne pêsi li Erûhê pêkhatiye û wê tekoşîne aştîyê ji li vir bi serkeve. Pişti axaftinan Koma Folklorê ya NÇMê, Koma Dengê Botan ú Bedran Şener derketin ser dikê. Li navçeya Batmanê Kercosé ji pirozbahiya Newrozê pêk hat ê nézi 2 hezar kesan tê de cih girt. Li bajarokên ser bi Nisêbinê Sitilîlê ú Kertiwêne ji pirozbahiye bi çop pêk hatin.

Gever bi 100 hezarî silav da Amedê

Newroza yekemin a 2010'an li Geverê bi tevlibûna 100 hezaran dest pê kir. Girse ji taxan bi meşê ber bi qadê ve meşîya. Meşa heri girseyî koma ku ji Bajêrgeh hati, bi pankarta "Herêma Bajêrgeh Newrozê piroz dike" pêk anî. Bi hezaran kes bi qasî 6 kilometreyan meşîyan ú hatin qadê. Ji ber tevlibûna mezin a gel hemû rê li trafikê hatin girtin ú di demeki kin de taxen navçeyê bêdeng bûn. Jin, zilam ú zarok bi cil ú bergeyên neteweyi li qada pirozbahiye rengê baharê dide her derê..



HAWAR NET / NÜÇE Ú AGAHÎ
TU LI KÜ Bİ, NÜÇE LI WÊ DERÊ YE

hawarnet.com

Kurdî û Kurdistanî

Terorîzekirdina reprodukt, resîvîlîzasyon û repolîze kirina civaka Kurd

AZAD BIŞENG

Her çiqas meriv bi prosesa sosyolojik çareserkirdina pirsgirêka Kurd bi pergelen hatin cerbandin u ê heyn sirove dike u pêvajoya herdiye dibe girehiç u geramol béguman pirsén weki, bi çi awayé emê karibin Kurdistan jiyanbar u jingës bikin ji bixwere tine? Gello jiyan aji dervêye Kurdistan, Kurdiyati u Kurdistan bi çi awayi bi sadi, berxwedar u bextewari bi gellê xweve dijin, bêyik û civak sedesed li hevkiri u wekhevlikiri? Felsefa sosyal ji piral bi çareserkirdina pirsgirêken hîyin u ê dûroj müjil dibe. Meriv çawa hêl u aliye tevger u lebata sosyal wek kes, kesayet u grup dinav yekîtiyek netewi de ji karibin binirxini, meriv dikari lebat u tevgera sosyal a mirovahî bi awayek gisti ji dikari sirove u amaje bike. Ji bo tekçün u pêsveçûyinê civakê de ji nérin u zaninek integral(bi tevayı, sercem) u mondiyal (gerduni) peviste.

Pirsgirêk, tekçün u pêsveçûyin meriv bi çandek integral karibe amaje u analiz bike, bawerdikim berbiyantiya (yabancılaşma) kesayet u çand, humanizm u politikayê pétir karibe bibine. Berihertistê binpêlkirin, perçikandin, küstün u jenosayda li himberi çand, humanism, politik u netewa Kurd, weki em hemu li hev diki barbarizmek bêhemaye, teroriste, kriminel u gotinan nayit vegotin u amaje kirin. Em hemu dizanin ku, ev lebat, tevger u heydedana diji hebûn u bûneweriya Kurd, 'TIRSE'. Em dizanin ji dahatû u dûveroja çanda tirsê tûneye, ev çand bixweve hemu nûjeni, nuti u gûhertinan ji diküje u civakê desivilize, demoralize, desosalyze, demonderne u criminelize dike. Ekoloji u aboriya heremâ lokal, netewi u internasional serûbin dike. Karanina teknolojiya neyini u bi cihkirina sedhezaran lesker ê tirk li heremâ demografiya Kurdistan vediguherine. Yek û bihevre jiyan terrorize dike, politikayê binpêlkirina mavenmirovane, dagirkirina dewlimendiya Kurdistan u bêdadwer u newekheviya parvekirinêye. Gef u heresa militarist sedemê hemu gêngesi, nexwesi, koçberi, ser u nakokîya navbera idoloji, ol, netew u etnisiteytan.

Nasyonalizm u fundemetalizma tirk, erep u pers mixabin hedonizma Kurdiyati u gûla sor ji parce parçê kirîye. Pirsgirêka Kurd ne lokal u heremi tenê dike xeterê de, jiyanâ mondiyal a gerduni ji weki tekçün u pêsveçûyinê aboriya internasional, karanina teknolojiya negatif, gûhertina ekoloji u demografiye u prosesa kultürel u politik ji herdiye dike kopi u jîgîrta dagirkir u sistema totaliter. Bizav, sazgeh, rexistin u partiya desthilatdar ji kopyek sistema dagirkir u totalitere u li ser çareserkirdina pirsgirêka Kurd ji 1978 heta niha erîni u neyinê xweve li ber çaveye. Pergelen ku hatin cerbandin u siweya xebata politikaya desthiletdar pêvajo u dûveroja Kurd bi pirali bin kontrola çand, kopi u jîgîrta sistema totalitere u pêvajo hin ji geremol u girehiç. Kurdistan ji erdnigara jiyanbar u jingësiyê pétir ji sedsal vêdetir bûye qad u warê tatbikata ser'an, artesen dagirkir, top, tifek u bombeyan. Bi erdhêj u zenzela ekolojik u parçekirina Kurdistan, herçikes bi xwe civak, mejûyê kollektif u konsesûsa Kurd ji parce

parce kiribe ji, li hevkirin, wekhevlikirin, nérin u perspektifa Kurd ji bin bondra yekali, yekrasti, yekparti, yekserok, yekol u yekçand rizgar nebûye. Bi prosesa globalizm u teknolojîmiza bêhempa de kes, grub, rexistin, parti an ji Demokratên Soreser divêt armancen nu yê civakê ava bike u pirsgirêkan bi sistemek nú çareserbike bavirinê. Weka:

- Çareserkirdina pirsgirêken Civaki Ji ber ku prosesa globalizmde politik, ekonomi, ekoloji, sosyal u çanda Kurdiyati pêde biçe Sipartek (enerjiya ekoloji, demografik, eroziyon, koçberi u stabilizasyon), Edaleta sosyal(Kurdistan ji endustriya çek u eskeran rizgar be), Demokrasi u mavenmirovân(azadiya fikr u ramanan, wekhevî, sisteme biryardayina selfdeterminasyon, xwe ji nuve organizekirin, tolerans) Peresin u pereşendina hest, çand u netewetiya Kurd (nasname, berbiyanti) u serê bêarmanç(Kustina mirovan, xirakirina gund u bajaran, Kurdistan bêmirov, ne sin u çol ne gengaze) pêviste bête rewastandin. Kesayet, grub, rexistin, parti u civaka Kurd ji gere nekeve bin bandora idoloji, ol u politikayê sistema kopi u jîgîrta dagirkiran. Dibe ku Kurd, rexistin, grub an ji kesayet ne wel hev bi fikirin u nérinek yekali binirxinin u heta navber de çandek ciyawaz, cihêreg u cuda hebe ji, ne pêviste çanda tirsê bîke nav me Kurdish. Ne serkevîna Kurdish ne ji bêyekiti u ezserketinê tê. Neserkevîna Kurdish ji nekaranina politikayê plûralist, ji

çanda tirs(kopî) u ne têgîstina politika u methoden konsesyonê têt. Nivisek a xwe li Kurdinfo'de min balkisand bu li ser modela konsesûsa elementen berpirsyari, avakirin u rizgarikirina civak u netewek weki konsesûsa navbera Politik(sazgeh, grub, rexistin u partiyen siyasi), Karsaz (dewlîment, karsaz, karmend, patron, karguzar) u Karker(karker, rençber u wekîdin). Ev berpirsyari ya Kurdish divêt pêk were.

- Sistemek nú Em hemû li hem fikirin ku, bêmebestiya çareserkirdina pirsgirêka Kurd bi sêve, struktûr, damezrak, sazi, metod u çanda ku lé tê karkirin u tekosandin ne gengaze pirsgirêka Kurd çareser bike. Her di çelal di be ku pedivî u pevîstiya me avahi u strûken civaki e nûjen rasyonel, integral (bi tevâhi) u prensip u patronen çandek plûral a civak li hemfîr u pevîst bibine hewcedare.
- Hewcedari politikayek mondiyal û gerduni heye Politikaya Kurd hin ji nexwedi politikayek mondiyale u ji vê pevajoya globalizmê hin ji havil u istifade nabe u bi tevâhi heremî, lokal u nasyonel müjil e. Teoriyek a Kurd li ser mondiyâlm, globalizm u dûverojê tûneye u bêdoktrin e. Demokratên Soreser divêt silek u awayek bireverbirina li ser politikayek ciyawaz u cuda a mondiyal organize bike. Politikayek integral ne teni bi fetisandina ser, herweha re bergirtina jenosayd, terorizm, criminaliteyt, eskerkirina welat, hilwesandina ekoloji, çolkirin I bêhesinahi, erdnigar, bêçekkirina dagirkiran u limberi hejari u xizantiya gel u civaki, erdhêj u karesaten sirust u xwezayê de ji Kurd u Demokratên Soreser gere xwedi berpirsyari, insiyatif u funksiyonel bin.

Li ser Yekîtiya Tevgera Kurd

OSMAN SILIVANI

Yekîtiya neteweyi ya Kurd ji du qonaxan pêk tê. Mijara ku em ê li ser rawestin, qonaxa yekem e. Di vê qonaxê de yekîtiya neteweyi ya Kurd di herêmê bakur de ji ber ku em runiştîyen herêmê bakur in, di herêmê bakur de çareserkirina késaya neteweyi Kurd, raste rast me eleqedar dike. Ev bê mafî u bê huquqî ya ku Kurd têde ne divê ku çareser bibe. Mafî miletê Kurd ji heye weki her miletê dinê yê azadi û serbixwe; ku xwedî ci mafan in, ew ji bibe xwediyê wan mafan. Bi kurtebiri pêdiviy kurd li ser axa xwe bibin xwediyê desthilatdariya xwe Miletê Kurd ê herêmî bakur ji bo ku bigiye mafîn xwe yê rewa u xwezayî, divê her kurdperwer ê herêmî bakur bê hesab têbikoze. Ci miletperwer, ci komonist, ci liberal û ci dindar miletê kurd ji weki her miletê dinê çawa ku ji çin û tebegan pêk tê û di nav xwe de cuda cuda nérin û bawerîyan dihewine; wek miletê dinê ne yek kêm û ne ji yek zede weki her miletî ye. Kurd di herêmî bakur de ji bo mafîn xwe ê neteweyi û demokratik zûtir bi dest xin, bê şik divê yekbin.

Pirsa yekîtiya Kurdish ji bêjevanê mezîn û payebilind Ehmedê Xani û vir ve di rojeva kurda de ye. Ew ronakbir û dûrbînê héja weha dibêje; "eger em yekbûna ew ê Fars û Osmaniyan bi serê hespén me bigirtana." didomine û dibêje; "ger ez xwediyê tac û text bûma min ê bêjeya miletê kurd bi heft dereca derxista ser bêjeya miletê dinê". Gotina yekîtiye, banga yekîtiye û daxwaza yekîtiye pîr xwes té guh. Daxwazek piroz û birûmet, zelal û xwes e. Lî, divê ku em kür bîfîkirin, ên komonist, miletperwer, oldar û hwd. nérinê ku hene çawa bêne ba hev û wan hemuya bikine çalekvanê neteweyi kurd. Gelo em ê van nérinê ji hev ku cihê cihê li dinê dinêrin û dibinin çawa binin ba hev û ewan hemuya bikin çalekvanê doza neteweyi kurd. Gelo em li mijare fikirine an na. Ger em kür, hûr û dûr li vê nérinê bîfîkirin, em ê bibinîn ku komonist û oldar di nav partiyek de nayin ba hev. Komonist encax di partiyek komonist de, oldar ji, di partiyek oldar de karin bixebeitin. Lewra, felsefa herdu nérinan ji hev cihê cihê ye. Ji sedan sed ji hev cihê ne û bi piyan hevûdu tavdidin û dipekinin. Ji ber ku felsefa wan a lénérina dinê li ser vi bingehî ava buye.

Ez, di qirnê 21an de çend xebatén ku ji bo yekîtiye hatin meşandin di nav de bûm, an ji jî nêzik ve eleqedar bûm. Yek ji vana Inisiyatîfa Demokratiyî û Çareserkirina pirs Kurd bû. Di inisiyatîfe û ez galekvaneki bûm. Endamê meclîse û birêvîbiriyê wê grûbê bûm. Ev grub, beriya ku egeren xwe pêk bine, bi lezûbez bû parti. Partiya Maf û Azadiyan-Hak-Par di encama vê xebaté de dameziri. Ev parti ji ber ku bi lezûbez bû parti, rewşa wê, girsehiya wê, xebatén wê û hwd. li holê ye... Heta ku serokê damezrêner Melik Firat serokê gelemerpi bû, çend oldar ji endam bûn. Dema ku birêz Melik Firat ji ber durdurustiye xwe serokatiya gelemerpi berda, ew oldaran ji dest ji partiyê berdan. Ev roj ji wan hevalan kes nayê partiyê. Mebesta wan kurdperweran ya bingehîn, xwe di vê partiyê de nabinin. Wexta ku birêz Melik Firat serokê gelemerpi bû, di her destpêka axaftina xwe de bi izna navê yezdan dilovan û Mihriban diaxfiya. Lî, ev roj serokê bi wi rengi, ne serokê Partiya Maf û Azadiyan e, lewra ji wan braderen kurdperwer kes nayê partiyê. Bila her kurdperwer bizanibe ku dinê ne tenê li dora wi digere. Xeyn wi û nérinâ wi ji kurdperweren hêja û bi kérhati hene. Pêwist

e ku ew ji di vê qada neteweyi de hebin. Çareserkirina kêsaya netewe ne di bin bandora nérin û felsefî de ye. Netewe xwediyê gelek nérin û felsefeyâ ye. Ji ber vê ré û felsefa xelet Partiya Maf û Azadiyan girse nabe û nebu partiya gelê kurd. Jar li hûr maye û dé her weha bimine. Xebatek din ji bo yekîtiye; parti, bir, bask û kesayetiyê kurd dest pêkîn. Li ser axaftina serokewzirê Tîriyeyê Teyib Erdogan ya sala 2005an ya li Diyarbekirê. Got "pirsa kurd pîrsa min e, em û evê pîrsi û çarçoveya demokratikbûne de çareser bikin." Li ser vê gotinê kurd, li hev cûn û hatin. Wey li wi ku ki bibe mixatab. Bi saya serê Melik Firat (Serkê HAK-PAR) û çend kurdperwer, di meha ilon a 2005an de li Enqereyê civîyan. Ew civin di encamê de berhewa bû, civin û daxuyaniya encamê, qediya. Hevalen diwanê bi insiyatîfa xwe di 18-19.11.2005an de li Diyarbekirê civîne din pêk anîn. Di encama vê civinê de bi yekdengi daxuyaniya

Rêxistinê temsili an nuneri divê ji bo endametiya kesan nexebitin. Ji bo endametaiya rêxistinê siyasi û civaki bixebeitin. Çiqas endamên van rêxistinê zêde bibin wek rêxistin, avahiya nûneri ewqas xurt û berfireh dibe. Lewra, ew avahi ci siyasi, ci civaki kesan raste rast, yek bi yek dikine endamê xwe û ewan endaman bi awayek siyasi û civaki perwerde diken. Ev hemu endam herweha endamê rêxistinê çardaxi ne ji. Van rêxistinê (parti, insiyatîf, platform, komelên civaki û hwd.) ku endamên vê rêxistinâ neteweyi ne, çendi xurt û perwerde bibin, ev rêxistinâ neteweyi ji xurt, berfireh û perwerde dibe. Hewcedariya politika herêmî bi yekîtiye bi vi rengi heye. Ev avahiya siyasi divê ji hemû endamên xwe û ji raya giştî re eşkere, vekir û zelal be. Ji ber ku ev roj di Tîriyê de û di piraiya dinê de, xebatén bin erd û veşarti dewra xwe tewaw kirine.

HÊZAXÊZ



Dewleta kurdî di peymanê nêvdewletî da

B.S. SILÈVANEYÎ

Piştî cengê cihaniyê yekê li sala 1914-1918 da û revîna Turkiya, bajêrê İstembol bûye xuceyeka baş bo xebata rewşenbîren kurd, bi taybet dema wan çîriskeka ronaihyê diti di axftina serokê Emîrîki (Wilson) da li sala 1918-ê, û 14 bend di axftina xweda aşkera kîrin. Benda diwê derbarey miletên li jîr destê hikumeta Osmani da û danana qewarekê (kiyan) bo wan miletan û bêne dirustkirin piştî rawestana cengê, ji ber vê yekê rewşenbîren kurd dest bi xebata xwe kirin, û daxwaziya serbexuya miletê kurd kür û arişeya miletê kurd berçavên civata (îsbe el umem). Li roja 10-i Tebaxê 1920, peymana Siver hatîye bestin, gelek babeten giring hatine bîryardan, û dibenda 62-ê da derbarey kurdan dibêje: Cihê kurdan pêdvîye desthilatdariyek navxuyî bo wan bête dan, û taybet ew cihen baraptir jî kurd bin, û dibenda 63-ê da dibêje: Di maweyê sé mehan da pêdvîye Turkiya bîryara bendê 62-ê bîcîn bîne û li dûv pilana hatîye danan, û dibenda 64-ê da dibêje: Kurdish maf heye peywendiyê digel civata (îsbe el umem) biken û daxwaziya serbexuya xwe biken. Belê li sala 1923-ê da li roja 24-ê recebê peymana Lozan hatîye girêdan, diwê peymanêda gîhorin hatîne kîrin di berjewendîya Îngîliz û Turkan da li ser kîstê miletê kurd, û arişeya wilayeta Mûsilîk kete cihê babetê kurdan, û bîryara wê ya 38-ê dibêje:

Turkiya peymanê dide hemû miletên xwe bi parêzin û azad bîbin û jiyaneka xwe û bextewer bîbirin, bê cêwazî dinavbera netewe û ziman ayinî da, û bîryara 39-ê dibêje: Turkiya ci nexweşîya neke beramber miletên xwe û zimanê xwe bikarinin bi azadi, belê Turkiya ci pûte bi van bîryaran nekîr. Derbarey vî babeti (Divid Migdol) di pirtuka mejûya kurdan ya nû li berper 278-ê da gotiye: Dema arişeya Mûsilîk ketiye berçav li peymana Lozan, (El Mihemed) Mihemed Nuri nîvîsiye bi zimanêk neteweyi, gotiye: Ji ber ko xelkê wilayeta Mûsilîk bê şewyekê giştî kurdin, boçi kesen ji derive di daxwazîyê xwe da amajeyek kêm ji miletê wan li wêrê hene? Ew daxwaziya me pêşkêkîbo peymana Lozan ne ji ber parastina kîmatiyê ye, belê ji ber hikumetîna mafî jiyanê bo mîletekê serbexo bijit li ser erdê xwe. Her (Migdol) dibêje li per 273-ê da ji pirtuka me amaje pêkîri: Bîritaniya digera Turkiya razi bike ji ber berjewendîya xwe, da Turkiya piştîrast bike ko babetê otunumiya kurdan bicil hêlan, xiyanetka mezintir eveye di meha remezanî da, sala 1922-ê, aşkera kir ko hikumeta Celal Şâhî Bîritani û hikumeta İraqê... Gerden azakirina xwe diyarkirina dewleta kurdî. Bi vi rengi avxtin di peymanê siyasi da hatîne ji navbirin

ú ji ber vê egerê Bîritaniya gunehbare ji xiyanetê beramber miletê kurd, û her (Divid Migdol) di wî berperida dibêje: Bîritaniya kurd bê eger (emden) bîchî hêlayîne bo hikumetîn erebi û merema wê ewe xwe piç piç xîlas bike ji peymanê dewli, her Migdol dirêji daye axftina xwe û dibêje: Peyman hatîye dan li pêş civata koma dewleti da û ew curê kargeri yê bi hête bi karinan derbarey kargeriya navxu bo kurdan li dûv bîryara lijna dûvçûnê, û piştî çend rojekan û 21-ê kanûna duwê da serok wezirîn İraqê (Ebdullî Mîhsîn El Sedûn) di civata endamên perlemani da got: Ev neteweye neset bijit eger mafî hemû bînyatîn İraqê ne hêne dan. Dûmahîka Turkiya bila bo me bibe serbor, pêdvîye em ne zivirin li ser siyaseta xwe ya berê ewa hikumeta Osmani, pêdvîye em mafîn kurdan bîyîne û divêt fermanberen wan ji zanabin û zimanê wan bibe fermi û pêdvîye me zanabin wan li qutabxaneyi bi zimanê xwe bixûnîn, û ya pêdvîye li ser me em serederiyekâ bas digel wan bikeyin li ser bîniyatê bê cêwazî, ci müslîman bin yan mesîhî bin, bi eda û hemû mafîn wan bîhêne dan. ev gotine li kombûna civata perlemani 21-î kanûna duwê, sala 1956-ê, da hatîye derêxistin ji pirtuka (Silokit ya Bîritani) ya İraqî laper 186-ê da, eve weku mezinîn me gotin, ((dibêjin belê napêjin)).

Ger dewleta Tirk serbest kirina zimanê Kurdî de ji dil be û naxwaze Kurdan asimile bike divê berê gavê din bavêje

Serhad B.RENAS

Wek tê zanîn AKP seleke berê tv'ye kurdî TRT6ê vekir. Ger li Tirkîye ser zimanê Kurdi zordari û pêşî lê girtinê mezin nebûya dibe ku vebûna kanala Kurdi wek gaveke ji dil û bo berjewendiyâ Kurdan bihata şirove kirin.

Lê wisa xuyaye ku dewlet û hikumta AKP li pêy xapandina Kurdan e. Vebûna kanala Kurdi bo tek birina zihniyeta inkara Kurdan a dewleta Tirk de gaveke mezin e, lê ji vê zêdetir bo Kurdan feydeya vê kenalê nine.

Divê xelkê Kurd berê piştgiriya pêşketina medyaya Kurdi bide

Niha ser satalayta nézi 20 kanalên Kurdi hene ku bi saya têkoşina kurdan de hatiye avakirin û wê ev hejmar hêdi hêdi zêde be û televizyonê heyîji wê hêdi hêdi pêşkevin.

Divê Kurd li şuna ku piştgiriya kenala TRT bidin divê bo pêşketina medyaya Kurdi ya heyîji ku bi saya xwîna Kurdan mezin bûye hewl bidin.

Divê hewl bê dayin ku televizyonê heyîji ya Kurdan di her warê de pêşkevin û bibandor bin.

Divê sermayeya Kurdan û

hemû Kurdi bo pêşketina medyaya Kurdi bi riya reklam dayinê piştgiri bidin.

Vebûna kenala Kurdî ya TRT tenê paşve gav avêtina dewleta Tirk di politîkayê înakir kirin û tune kirinê de ye. Dewleta tirk li şûna tune kirinê êdî rîbaza kontorlî kirina kurdan dibejirîne. Ji vê yekê zêdetir feyde û mane vê kenalê nîne û divê Kurdi ji kenala Kurdî ya TRT vê noqteyê zêdetir tişt hêvî nekin û cûdatir şirove nekin.

Ger dewleta Tirk di meseleya Kurdi de ji dil be...

Heger dewleta Tirk serbest kirina zimanê kurdi de ji dil be û berjewendiyâ Kurdan difikire û naxwaze zimanê kurdu lawaz be divê berê wan gavan bavêje;

1- Navê Gund, navê, bajar û cihen Kurdan paşve vegerine Kurdi.

2-Di fermiyetê de (şaredari, dibistan, zanineh, nexwexane, daireyên fermi) zimanê kurdi bi her avahî were bikaranin.

3-Dev ji ceza dayin û qedexe kirina rojname, pirtük, malper, kovar, radyo û televizyonê Kurdan berde.

4-Bi temamî qedexeyen ser kurdi di mitingan, afişan û propagandayen siyasi de were rakirin.

5-Ne di TRT de bila mafê weşana bê sinor bi zimanê Kurdi di tv yén taybet de were dayin.

6-Bila besen Kurdolojiyê di zaninehan de were vekirin.

7-Perwerdeya bi zimanê kurdi (di seri de heri kêm yê destpêkê û dersen bijare) were serbest dayin.

8-Li Tirkîye zimanê Kurdi wek zimanê fermi heri kêm di asta bakûrê kurdistanê de were pejirandin.

Ger dewleta tirk heri kêm wan xalan bi cih neyine kanala Kurdi ya TRT dê ji xapandin û zêdetri xistina Kurdan kontrola dewleta Tirk zêdetir wateya wê nebe.

serhadrenas@yahoo.com

Em kurdêne Tirkîye ji miletbûnê dûr ketine...

ZINARÊ XAMO

Di nivisa xwe ya do da min gotibû ku ezê herim şahiya Newrozê li Aynur Doganê û li muzika irani guhdari bikim. Ez gelki tije bûme, dibê ez ji we ra işev qala "dengbêja kurdi ya bi nav û deng" Aynur Dogan xanimê bikim. Li gel ku berf û bahoz bû, me rabû ji malika xwe da rê em cûn. Bilîtên xwe me du roj berê bi riya internetê kiribû.

Konserê saet di 19-an da dest pê dikir. Em çend deeqeyan beri destpêkirina programê gihiştin ciyê şahiye. Şahi li Qesra Belediyê, li Salona Hişin bû. Xwarina(şiva) Nobelê li vê salonê tê dayin.

Saloneke muhtesem e. Herçiqas em çarîkekê berê çübûn ji lê salon heta ber dev tije bû, ji bo ku ciyên xwe bibinin milet pê li serê hev dikir.

Bi xêra teşrifatîjîyen salonê me ciyê xwe dit û bi meraqake mezin em rûniştin. Ev cara pêsi bû ku ez û xanim diçûn çev û şahiyeke kurdi û farisan ya bi hev ra. Ji bo min tişteki nuh bû. Simayênuh, xezalênuh faris yê çavres, bejinzirav û narin hemûji ji bo min nuh û xwes bûn. Û salon ji gelki xwes bû. Pêşkêvanê şevê lawê Mamosteyê hevalê min listikvan û komedyenê bi nav û deng Ozz Nûjen bû. Ji zûda bû min li programen wi temaşa nekiribû. Dema dest bi axfitinê û henekan kir, min dit ku çiqası bi pêş ketiye û rehet e. Gelki këfa min hat. Li hember swêdi û iraniyan serê me ji ber bilind bû, pir rehet û ji xwe bawer dipeyivi û henekên xwes dîkir. Min di dilê xwe da got, ez hêvi dikim ku Aynur xanim ji bi deng û hunera xwe serê me bilind bike. Lê mixabin ez şas bûm, Aynurê em mahcûb kirin, tu nemabû ku salonê bide valakirin...

Dengbêja pêsi Sima Bina ya irani bû. Sima xanim, stranbêjeke geleri ya Iranê ya heri mezin e, pir populer e. Loma ji belki ji sedi heysteî temâsevanan irani bûn. Sima xanimê, nêzi saetekê ziyaferetke muzikê ya muhtesem dema temâsevanan; him bi dengê xwe û him ji bi muzika xwe ya gelêri. Erê ji xwe muzika irani gelki xwes û narin e, lê Sima xanimê bi wi dengê xwe yê wek yê Şalûl û Bilbilan xweşteir kir, ez mest bûm...

Muzik û pêkeninê pişti Simayê hatin pêşkêskrin ji xwes bûn, meriv aciz nedibû. Hemû ji irani bûn. Ozz, ruyê me sıpi kiribû, nuha dora Aynurê bû... Aynur dawiyê derket sahnê. Lê xwezi derneketa, hindik mabû ez ji rabûma. Malneketê di vê şeva kéf û şahiye da û him ji belki ji sedi heysteî temâsevanan irani û swêdi bûn, bi "ez rebenim, rebenim, rebenim" dest pê kir û bi "loloo, lêlê, loloo, lêlê" ji qedand.

Ü ji xwe min bala xwe dayê weki din ji nikanibû du gotin baniya hev.

Ev cara pêsi bû ku min bi dijet li Aynurê guhdari dîkir. Carê min dit ku ji bin de bi kurmanci nizane, diksiyona wê sifir e û zimanê wê nagere hin gotinan bîbêje. Pişti çend stranen heznitîyê û şinê, leqin bi salonê ket, gelek kes rabûn. Carê ne muzik muzik bû û ne ji dizanibû bistira. Gelo li ku dera cihanê hatiye ditin ku yeki/yeke bi zimanekî nizanibe, nikanibe bi şikleki dirist bîbêje Newroza we pîroz be, rabe bibe dengbêja wi milieti, bi wi zimanî bistirê? Ez fêm nakim, insan cawa bi zimanekî nizanibe û rabe bi wi zimanî bistirê?

Ev sosireta tenê li ba me kurdêne Tirkîye heye. Li ba me, ne kurd in, bi kurdî nizanîn lê disa ji dibin serokîn me. Bi kurdî nizane, dibe dengbêja kurdi... Dema muzikenen farisan dest bi lêdanê kirin, çer'gotin tinggg, meriv fêm dikir ku ev muzika farisi ye. Lê ya gurûba Aynurê meriv nizanibû ci muzik e, galo muzika tirka ye, ya ereba ye ya ji ya elewiya ye... Tişteki tevlihev û qedisibîya dengê muzika kurdi...

Ü dengbêjê ji bi kurmanci nizanibû, hema digot, "ez rebenim, rebebenim, rebenim..." Min ji xanimê ra got, tu ferqa me û xelkê dibini, bi rasti ji em kurdêne bakur reben in, tu tişt di me nemaye.

Bi zimanê xwe, bi muzika xwe, bi kultura xwe em bûne gérmiya gavan, bûne ibret, bûne sosiret. Pirs ev e: dema insan bi zimanekî nizanibe cawa dikane cesaret bike, bibe dengbêja wi zimanî û di ser da ji meşhûr bibe?

Careke din derket holê ku Diyarbakirspor sîleheke dijî Kurdish e

PÊŞKETIN

(Faşistên Tirk xwedî li Diyarbekirsporê derdi kevin da ku bi riya wêKurd bêne asimile kirin.

Hemû partiyen Tirkân, faşistên Tirk û dijiminên Kurdan li pêy hev ketin dorê û mayina Diyarbekir sporê di liga super de daxwaz kirin. Armanca hemûyan ji ewe ku bi riya Diyarbekirsporê Kurd zêdetir asimile û engere were kirin û ciwanenê Kurd zêdetir bêne xapandin.. Pişti Maçen Diyarbekirsporê yêni bi Bursa û İstanbul Belediyeyê re ku ji ber buyerên aligirên Diyarbekirsporê nivco mamû, iştimalek mezin û li gor qanûn û talimatnameya Fifayê divê Diyarbekirspor ji ligê bê daxistin. Di rézikname de té

nivisin ku dema aligirin timekê di dewreyekê de du caran bûne sedemê maç betalkirinê ew tim di her du maçan de ji hukmi têk diçe û ji ligê ji tê daxistin. Federasyon encama maça Bursayê diyar kir û D.bakirspor wek tê çûyi hate qebûl kirin.

Lê, her çiqas talimatnameya Fifayê wisa be ji rayadar û partiyen dewleta Tirk û niviskarênen rojnameyan yê naskirî û her weha medya tirk ji bo berjewendiyê xwe û propagandaya dewletê bê kirin daxwaz û daxuyanî didin da ku Diyarbekirspor di ligê de bimine. Wek tê zanîn serokê Diyarbakirsporê AKP'yi ye Diyarbakir spor ji bo kontrol kirina ciwanenê kurd té bi kar anin

Divê kurd di vê mijara girîng de hişyar bin. édi divê herkes fam bike ku piştgiri dayina Diyarbakirspor piştgîrî dayina armancenê dewleta Tirk e. Divê ciwanenê Kurd ji hişyar bin.

Bi saya futbol û meduya Tirkî ciwanenê Kurd têne bêmeji û bêfîkr û bê hîzr û bê çand kirin. Bi taybeti bi futbolê bal û enerjiya ciwanenê Kurd tê xerc kirin. Weki minak pişti maçen timen Tirkân li tevahiya Amed û bakurê Kurdistani pirozbañi tê li dar xistin û bo taximên Tirkân bi coş û pêroşî çepik tê lêxistin û piştgiri têne dayin ku wek tê zanîn Tirkîye futbolê(pêgog) bi taybeti bo pêşxistina nijadperestiya Tirk û bêhiş kirina civakê bi kar tine..

Ala Tirkî û ala Kurdî

İBRAHIM MALGİR

İro ev rastiyek ya cihanê ye ku hemû millet ji ala xwe hez dîkin û ew tiştek tabii ye ku wê, yani ala xwe biparézin.

Demê şer di nava du miletan de germ be, wê çaxê her du ali ji ala hev hez nakin û her ali duxwaze ala xwe bide pêş. Carna nakoki hewqas kûr dibe ku, ala hev dişewitinin û ev yek dibe sedemê kin û nefret ê.

Cara yekem min ala Iraq û ala Kurdi li teniştâ hev dît û ev yek ji min re pirr ecêb hat.

Ez fikirim û zêde wext ne girt û min fêm kir ku, her çuqas dijminahî kûr ji be, wextek tê her du milet mecbûr dîbin ji hinek tişten hev re hurmetê nişan didin û ev yek ji ne ecêb e.

Wek alê hindek tişten ditir ji hene ku lazime em jê re rez bigrin, wek Jiyana bi hevre bûne. Heger ne welê be, bi dehan salan û bîstên salan ji be, wê mirov şerê hev bike, lê wek Iraq'ê wê rojek bê lihevhatinek civaki çêbe û mirov mecbûr bibe ku, hev qebûl bike û ci yek kurd be, ci ji yek ereb be.

"Ew roja ala Kurdi û ala Tirkî, wek ala Iraq'ê û ala Kurdi wê li teniştâ hev cî bigrin. Jiyana bi hevre a bi aşîti ji wê cî bigre û ev nakokiya iro ne mine. Ne MHP'a Tirkî nejî hinek kurdêne hemdê xwe têna provaqasyonê û dibin aligirê kûr bûna nakoki ya nava herdu gel a, wê bi ser neke ve. Jibo vê yekê ji, ji hev re rez girtin wezifa herdu terefa ye."

Tiştên weha ji seride bê fikrandin û tehemul bê nişandan û rez li hev begirtin, wê kesek ji vê newê xusirandin. Jibo wê yekê ji, ci kurd be ci ji tirk be, li metropolan bi hevre dijin û dawiyê wê rewş bê guhertin û herdu milet ji mihtacê hev bibin. Ji iro de ev bê zanîn û nakoki ya nava herdu gelan de newê kûr kirin, wê baştır bibe.

Ew roja ala Kurdi û ala Tirkî, wek ala Iraq'ê û ala Kurdi wê li teniştâ hev ci bigrin. Jiyana bi hevre a bi aşîti ji wê cî bigre û ev nakokiya iro ne mine. Ne MHP'a Tirkî nejî hinek kurdêne hemdê xwe têna provaqasyonê û dibin aligirê kûr bûna nakoki ya nava herdu gel a, wê bi ser neke ve.

Jibo vê yekê ji, ji hev re rez girtin wezifa herdu terefa ye.

Li Frensayê çepgir serê Sarkozyê diêşînin

PARÎS (Pêşketin) : Li Frensayê Sarkozy piştî tekçûna di hilbijartinan de niha bi çalakiyên rû bî rû ye. Bi hezaran fransî li bajarên curbicure vi welati bi nişana nerazibûna li hemberê siyasetên Nicholas Sarkozy serok komarê Fransayê yên derxistina bi hezaran karmendên dewletê û reformên dewleta vi welati xweniştandan réxistin. Li gor raporta kanala Franc24, ev meşa tenê rojekê piştî guhertinên li dewleta Fransayê û këmekê piştî şkesta giran a rastgiran li hilbijartinên herêmiye vi welati bi rê ket.

Li gor raporta kana Franc24, li Parîsê zêde ji 60 hezar karmendên dewletê beşdarê meşê bûn. Li bajarê Bordo ji 30 hezar kes beşdarê meş û xweniştandan bûn, eva li halekê de ye ku li bajarên dine Fransayê ji nerazibûnê berfireh li hemberê siyasetên dewleta vi welati hatin nişandanê. Gelê Fransayê li dewra duyem a hilbijartinên navçeyî yên vi welati da, dewleta Sarkozy û bereya piranî a Rastgirêne parlemana vi welati rastî şkesteke giran anin. HAWAR NET.com



KURTE NÜÇEYÊN NAVNETEWEYÎ

Amerîka hewl dide ku Çînê bi fuzyeyan dorpeç bike

Li gorî pisporêñ leşkeri yên DYA û Çînê, DYA Çînê bi mortalêñ fuzyeyan dorpeç dike. Heman tiş berê ji ji aliye başûrê Ewropayê ve li diji Rûsyayê hatibû kirin, lê ji ber bertekan paşve hatibû kişandin

Leşkerên Amêrikî ji bo demekî ne diyar dikarin li Haîtîyê bimînin

Baylozê Amêrikayê li Haïti Kenneth Merten tekez kir, ku Leşkerên Amêrikî ji bo demekî ne diyar dikarin li vê giravê Karibê bimînin. Agahiya han ji aliya ajansa RIA novostî hatiye belav kirin.

6 hezar eskerên Amerîka li Efganistan û Iraqê mirin e

Hate diyar kirin ku ji dema érişa Amerika ser Efganistanê li sala 2001 û érişa ser Iraqê li sala 2003 heya niha zêde ji 6 hezar eskerên Amerîka jiyana xwe ji dest dane. Herwiha li gor bilançoya Pentagonê (wezareta parastinê ya Amerîka) zêde ji 31 hezar û 732 eskerên amerîki ji li şer û pevçûnê nav Iraqê birindar bûne û li Afganistanê ji bi hezaran eskeriyên amerîki birindar bûne

Îranî ji qehrên xwe benîşt dicûn

Li gor nûçeyeke rojnameya aboriyê ya Farsi Îrani di hefteyê de bi qasê 2 milyon dolari benîşt dicûn. Her wiha hate diyar kirin ku asta çütina benîstan ji her diçe zêdetir dibe. Li iranê hejmara kesen benîsthez di nava 4 salan de 100 car zêde bûye. Tê diyar kirin ku Îran benîstê ji welatên din ithal dike û li iranê ava kirina febriqayê benîstê hatiye rojevê.

Delegasyonê Rûsyâ û DYA gihiştin dawiya amadekirna peymana START

Derbarê vê yekê da wezirê derva yê Rûsyayê Sergey Lavrov piştî hevditina xwe li gel wezira derva ya DYA Hillari Clinton daxuyanê da. Lavrov got: 'Em kîfxweşin ku telimata serokên Rûsyâ û DYA tén pêk anin. Her du serok bi xwe encamén xebata delegasyonan kontrol dikan. JI BO ZEDETIR NÜÇEYÊN NAVNETWEYÎ hawarnet.com

Li Iraqê pevçûna "dengan" mezin dibe



Serokwezirê Iraqê Nûri Maliki gefa vê yekê kiriye ku dê tev karmendên Komisyonâ Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinê Iraqê bigre.. Listeya Dewleta Yasa ku Nûri Maliki serokatiya wê dike daxwaz ji komisyonê kiriye ku li cihê kampûterê bi dest pêvajoya hejmartina dengan encam bide, ji ber ku listeya han di vê baweriyê de ye ku data bi awayekî durist di navenda hejmartina niştimanî de nehatine tomarkirin.. HAWAR NET.com

Li Efxenîstanê rewş aloz e



KABIL: Berpirseki dewletê li eyaleta Hilmend a Afganistanê ragihand ku di encama pevçûnê li vê eyaletê de 40 militanên Taliban hatine kuştinê. Serokdewletê Afganistanê Hamid Karzai, li paytext Qabilê bi nûnerén Hezb-e-Islamî ya ku di bin serkêsiya Hikmetyar de diji rejimê şerê çekdari dike, re, rûnişt. Hezb-e-Islamî, li Afganistanê yek ji 3 réxistinên bingehin e ku li diji rejimê şerî dike, bo çareseriya pirsgirêkê ku "plana aştiyê" dest pê bike, gavek avêt. Vê komê, li rojhilat û bakurê Afganistanê li diji leşkerên NATO û Afgan şer kiribû.. HAWAR NET.com

HAWAR NET.com

kurdistan amed duhok
zanyarî zaxo amed
mîrdîn batman duhok
cizîr erkenî wan hewlîr sine agirî xaneqîn
sîrt sîrnex colêmerg mehebad riha erdiş bedlis
silêmani nûçe idr qamiso
aktuell çand zanist ziman huner
ueribol paris tehran bûyer teknoloji
brussels makkah bûyer teknoloji
zanîn xwe nasîn e...
HAWAR NET
hawarnet.com

Obama serkeftina xwe ya pêşî bi dest xist

Ev reforma girîng 40
sale nedihat kirin

(Pêşketin): Civata Nûneran ya Kongrêya
Emeriki bi ciyawaziye kêm bernivîsa
qanûna reform kirina sistema tenduristiyê
pejirand. Li gor reformê edi li DYE dê herkes
bibin xwediyê sigortayê tenduristiyê. Obama
û rayedarêm mezin yên qesra Sipi
xweşaliya xwe biramberi pejirandina
reforma saxlemî diyar kirin. Civata
Nûneran, ya kontrol kiri ji layê
Demokaratan ve, bi 219 biramber 212
dengan reforma saxlemî pejirand. Hemî
endamên Partiya Komari û 34 Demokratan
deng dijî wê bernivisê dan. 216 deng pêdivî
bûn ji bo pejirandina wê bernivisê. Dengdan
û pejirandina reforma saxlemî serkeftineka
mezin bû ji bo yek ji pirsên heri giring yên
karnama serok Obama. HAWAR NET.com



Îsraîl di meseleya Qudîsê de
paşve gav navêje

Îsraîl û DYE li ser pirsa berdewamkirina
avakirina xaniyan li rojhilata Qudsê li hev
ne kirin. Ew zanyarı ji aliya sekreterê
çapemeniya hukumetê Îsrayîlê Mark Rêgêv
hat ragihandin. Mark Rêgêv daxuyaniya
nûnerê serokwezirê Îsrayîlê Benyamin
Netenyahû Nîra Hêfêz wisa şirove kir. Berê
hin dezgehîn çapemeniya rojava
ragihandibûn, ku Îsrayîl û DAY li ser
avakirina xaniyan li rojhilata Qudsê li hev
kirine. Regev destnişan kir, ku Hêfêz bi
giranî li ser helwêsta Îsrayîl sekiniye û ji
ber wê yekê ji nîrêna giştî rôkûpêk destnişan
ne kiriye. Çawa ku tê zanîn di meha Adarê
da rêveberên Îsrayîlê ragihandin, li rojhilata
Qudsê wê zêdetir ji 1500 xaniyan ava bikin.
Ew beşa bajêr di sala 1967-an de ji aliya
Îsrayîlê hatiye dagir kirin, lê belê Felestînî
rijhilata Qudsê weki paytexta dewleta xwe
ya nepejirandi dihesibinin. Û piraniya
dewleten cihanê dagirkirina wan erdan ji
aliya Îsraîlê napejirinin.

Zingilên şer lêdide; Gelo întîfadaya sêyemîn destpêdike

Bi avakirina wargehên nû li Qûdisê pêvajoya aştiyê xetimî û banga întîfadeyeke nû tê kirin.

(Pêşketin): Li Qûdisê pevcün ji nû ve gûr dibin. Biryara avakirina wargehên nû li rojhilata navin
alarma şereki nû dide. Serok Wezirê Israilê Binyamin Netanyahu diyar ki ku ew dê avakirina
wargehên nû bidominin. Di şerê Ereb u Israilê da li sala 1967 Israilê rojhelata Qudsê dagir kir û
piştî himgi gehanda xwe. Desthilata Felestînî imkana nû diyalogê bi Israil re ret kir û vejandina
diyalogê bi rawestandina avadanê liser qadêne felestînî yên dagirgirê ve girêda. Ev yek Yasir
Ebid Rebo sekretêre komîta navendî ya tevgera rizgariya Felerstînê û bêjedare bi navê

serokê Delestînê Nebil abû Rûdîn ragihandin. Mesele ewe, ku beri nûha axavtin bi taybeti
liser cemidandina proseya avadanê dihate kirin. Weke dihate gotin Netanyahu ji qebûl
kiribû, ku avadan bête rawestandin. Lî ji nişkave ev pêngav hate avêtin, zêde ji vê Israil ev
helwest nişan da dema, ku cîgirê serokê Emerika Bayden li Israil bû, loma ev pêngava Israil
mînaka bangewaziyeke dijê pêkolên çareserkirina pirsgirkê tê nirxandin... HAWAR NET.com

Ji ber skandalên seksê dêr vala bûn...

Cîhana Xiristiyanan bi skandalan dihêje

(Pêşketin): Di encama skandalên seksê li Dêrén Avusturya, Elmanya, Brezilya û İtalya'yê de bi hezaran
kes navên xwe ji wan qeydên déran derxistin. Tê diyar kirin ku her meh nêzi 5000 hezar kes ji déran
vediqetin. Tê payin ku dev ji berdانا endamtiya déran dikare berdewam bike.

JI BO ZEDETIR NÜÇEYEN NAVNETWEYI hawarnet.com

20 welat ku di cîhanê de tevkijiya
ermeñiya bi awayê fermî qebûl dikan

Rêxistinê ermeni ketin nav liv û lebatê ku pêşnûmebiryara tevkijiya ermeniyan di
parlementoyê İspanya û Ingilistanê de ji bidin qebûlkirin. Li Ingilistanê komisyoneke
ku ji 12 parlamenteran pêk tê hat avakirin. Dê ev komisyon li ser daxwaza
qebûlkirina tevkijiya ermeniyan ya roja 24'ê nisanê hûr bibe. Komisyonê yekemin
car e ku li Ingilistanê di serê meha çileya isal de girt dest. Duyemin car derbaskirina
di ber çav re dê dawiya vê mehê pêk bîne.

Êrişkarên xwe kuştinê li Kandaharê dan:
30 kuştî

Li başûrê Afganistanê Kandaharê 4 êrişen bombekari yên xwe kuştinê pêk hatin.
Hate ragihandin ku, di êrişen de heri kêm 30 kes hatine kuştin û ji 40 zêdetir ji
birîndar hene. Li gorî nûcuya BBC'ye, teqîna yekem saet 15:30'ê gorî saeta cihanî
rûda. Li gorî agahiyêne ku polisên Afganistanê dane, êrişen girtixaneyek, mizgeftek,
otèlek û cihe bazarê hedef girtiye.

Li Rûsyayê her sal li dora 100 hezar
mayîn têne bê bandorkirin

Serokê navenda xwendegha muhendisiye ya Hêzên Leşkeri ya Rûsyâ Federal
serhing Vasilîy Kondratûk ragihand, ku li Rûsyayê her sal li dora 100 hezar mayîn
têne bê bandorkirin yên di dema Şerê Cihanê yê Duyemin ya salên 1941-1945'an li
meydanê şer da hatibûne çandin.

**Di KURDO de
her tîşt li ber
destê te ye...**

**Ename, sohbet, lîstik
nûçe, video, kêf, agahî
û zêdetir...**

Zanist û Teknolojî

Pevçûna jin û mér mirov nexweş dike...

AMED (Pêşketin)

Derket holê ku zewaca nebextewar, pêwendiyên xirab yên di navbera jin û mér de mirov nexweş dike..

Li gor lêkolina rê liber derketina proteïnek xwinê digire ku di çareserkirina stres û başbuna birinan de roleki taybet dilize. Di xebata laboratuarê de zanyaran liser milên hin kesan birinê biavi çekirin û tesbitkirin ku birinê jin û mérén ku pevdicinin ji yên li hevdu derengtir rehet dibin.

Li gor lêkolina ku di kovara "Archives of General Psychiatry" de hat weşandin, "zewaceke bi gelş ne mimkune ku mirov bê stres bîhèle". Di pêwendiyên wiha de hucreyên xwinê yên sîpi çêbûna "proinflamatuar" asteng dikin ku di tedawiya birinan de ji % 60 rolekê dilize.


HAWAR NET.com



Kesayetiya şizofrenik nexweşiyeye çawa ye?

Kesayetiya şizofrenik yek ji cureyên kesayetiye nexweşketi ye. Tabloya gelek nexweşiyen psikologik e. Di raman ú tevgerê de bewateyi, kêmketina têkiliyên rojane, di axavtinê de dijwari, têkçûna jiyana sosyal, jarketina laş hwd ji simptomên wê ne. Kesayetiya şizofrenik nişaneyâ gelek nexweşyan e, divê li klinikan were tedawikirin..

Destê ku veqete dikare ji nû ve derkeve!



AMED (Pêşketin): Derket holê ku gena bi navê P21 ji nû derketina lebatan asteng dike.

Eger gen were sekandin dikare lebaten ku jê dabin ji nû ve derkevin. Zanyaran mişkeke ku genekê wê hatiye derxistin de dîtin ku lebaten mişkê xwe nû dikin. Bi avayekî teorik be ji heman tişt dikare di mirovan de ji pêk were.

Wek tê zanîn hin hewyanen wek gûmgûmok dikarin dûv (boçik) ên xwe yên jê büyî ji nû ve derxin.

HAWAR NET.com

Cixare depoya bakteriyen nexweşiyê ye

Encama lêkolineke dawi nişan dide ku li cixarê de bakteriyen curbicur ji wan hin bakteriyen nexweşiyê li mirovan de hene.

Lêkolerên tenduristiya jîngîhê yên zaningeha Írlandê û yên navenda lêkolîne a Liyona Fransayê gihiştine vê encamé ku cigarette bi xwe çavkaniya rasterast a veguhestina civateke berfireh a mikrobén nexweşiyê di nava cixarekşan û her wiha wan kesan de ye ku li ber dûkela cixarê disekinin.




Jin ji rexneyan û jibîrbûnê hez nakin

Ji jibirkirinê eciz dibin. Jin dizane ew heq nake ku bê jibirkirin.

Li gor lêkolina kovereke psikolojiyê derket holê ku jin heri zêde ji jibirkirina ji aliye mérén xwe ve ecizin. Li gor lêkolîne té diyar kirin ku jin bi qedrekî kêm qimê nayne, jin naxwazin ku his û hesten wê liser guh bê avêtin. Divê jin xwe li mala xwe wek karkereké his neke.

Ji aliye malbata mér nabe ku jin tenê wek bûk bê qimetkirin. Mér divê di pêwendiyen cinsî de jibîr neke ku ew ne bi tena serê xwe ye. Her wiha jin ji rexneyen zêde hez nakin. Bila haya we hebe. HAWAR NET.com



Robota pêşîn a xwedî îskelet; Kojîro

Robot hêdi hêdi dişibin mirovan. Kojîro ku xwedî istekela wek morivan e dikare endam û lebaten xwe dikare wek mirovan hereket bike. Kojîto ser istkelata xwe dikare wek mirovan tevbîre û endamên xwe yên wek dest, pê, qirik û çimên xwe hereket bike..



Ji bo jîndariya goştên ser neynûkan

Amadekirina losyona neynûkan...Nîv kevçîye şeranî sihik.. Zerdika hêkekê. Kevçîyeke ava ananasê

Malzemeyan baş tev bidin, serê tiliyên xwe nîv saetê di vêlosyomê de bîhelîn.

Dê goştê ser neynûkên we jîndar û saxlem bibin.

weşanên nûçe - rojname - tv - kovar - radyo

Hemû lînkên ji medyaya Kurdi.

Cihê we yê destpêkê!

Bixwinin - Zindî Temaşa û Gûhdarî bikin
medyayakurdi.com



Kanser êdî sedema sereke ya zû mirinê ye

AMED (Pêşketin): Belav bûna kanserê ditirsine..Her çiqas têkoşina hemberî kanserê zêde bûbe ji tê diyar kirin ku êdi kanser di nava naxweşyan de büye sedema sereke ya mirinê. Pişpor diyar dikin ku güherîna şerten jîyanê, jîyanâ bê hereket, xwarîna xirab û pir bûna nifûsê zêde bûna kanserê yani pêncşerê ji zêde dike. Her wiha pispor diyar dikin ku her sal heri kêm 100 hezar kes ji ber qelew bûnê dîbin kanser.

Texmîn raste; Dînazor ji ber asteroîdê mirin e

Texmina asteroîdê rast derket. Hate diyar kirin ku beriya 65 milyon salan Dînazor ji aliye asteroideke pir mezin hate ji holê rakirin. Li gor lêkolina zanyaran asteroîdê ku serdemâ Kretase-Tersiye de li cihanê qelibîye ji bombe atoman mîlyar car zêdetir bîhêzir büye. Li gor lêkolîne pişti qelibîna asteroîdê cihan ji ber tozên rabûne pir sar bû û di nava çend rojan de nîv cûreyen heywanan ji holê rabûn..

Çand û Hûner

Alice in Wonderland bi avayekî 3D we dibe nav mûcîzeyan

AMED (Pêşketin)

Alice in Wonderland yani bi kurdî Alice Li Mucizeistanê filmeke ji nû hattiyê kişandin e. Alice Li Mucizeistanê romanekê zarokan e ku di sala 1895'an hatiye nivisan ú careke din digehêje bi temşavanê sinemayê.

Alice (Alis) dide pêy kivroşekêkê ú xwe li welatê mûcîzeyan de dibine. Di nava kesên ku Alice'ê li Mucizeistanê pêswazi dikin de bi rola Mad Hatter Johnny Depp ji heye. Her wihha Anna Hatawy ku di sala 2009'an de wek berendamê Oscarê hatibû destnişan kirin ji cih digre. Filmeke bikêf e ú hin dikarin bi malabti biçin vê filmê. Film bi teknika d hatiye kişandin.

Nasname

Cure : Fantastik / Zarok / Malbat
Dema Nişandana li Cihanê : 5 Adar 2010
Derhêner: Tim Burton
Senaryo : Linda Woolverton , Lewis Carroll (Pirtük)
Görüntü Yönetmeni : Dariusz Wolski
Çeker: 2010, DYE
Listikvan
Mia Wasikowska (Alice) , Johnny Depp (The Mad Hatter) , Helena Bonham Carter (The Red Queen) , Alan Rickman (The Caterpillar) , Michael Sheen (The White Rabbit) , Crispin Glover SINEMAKURD



Di roja şanoyan de li Amedê lîstik bê pere ne

Şanoya Bajêr ya Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê (DBŞT), wê di 27'ê Adarê Roja Şanoyan a Cihanê de listika zarokan a bi navê Çiya Gihiş Behrê ú Çirokek Zivistanê bê pere bilize...

Derhênerê Hunerê yê Giştî yê DBŞT'ê Ruknetin Gun got ku di 27'ê Adarê Roja Şanoyan a Cihanê de Enstituya Şanoyê ya Navneteweyî Danezana Şanoyê ya 2010'an bi şanogerekî daye amadekirin wê beri listikê bi tirkî ú kurdi bixwinin. Gun da zanîn ku 27 Adarê roja şemîye de saet di

11:00'an de listika zarokan a Çiya Gihiş Behrê ú saet di 15'an de jî listika Çirokek Zivistanê wê bê pere bilizin. Gun got ku wê beri listika zarokan Danezana Şanoyê ku wê bixwinin ji bo zarokan hinekî zelal bikin.

Gun diyar kir ku di 27'ê Adarê Roja Şanoyan a Cihanê de pirsgirêkên ku dijîn ji têr rojevê ú got; "em ê ji hewl bidin ku pirsgirêkên şanoya kurmancî bidin zanîn." Gun diyar kir ku tevahîya şanoyan pirsgirêkan diji lê şanoya kurmancî pirsgirêkên ji van cihê ú girantîr diji ú got ku çavkaniya van pirsgirêkan ji ber ku şanoya kurmancî meşrû ú wekhev nayê ditin pêk tê...

Qubadî xelata festîvala Meyame bi dest xist



Filma "kes haydarê pişkînê İranî nîn e", ya derhênerê kurd Behmen Qubadî, xelata festîvala navdewletî ya Meyame ya Dewletê Yekbûyi yê Amerikarê bi dest anî. Bahman Ghobadi, Bahman Qobadi Filma "kes haydarê pişkînê İranî nîn e", berhemâ dawiyê

ya sînemakarê kurd Behmen Qubadî ye ku di festîvala navdewletî ya Meyame de, xelata baştîrin filma festivalê bi dest anî. Di vê festîvalê de ku 27'emin xula wê bû, 115 filmên sînemakarên cihanî di 45 beşen cuda de hatin nişandan, filma kes haydarê pişkînê İranî nîn e ya Behmen Qubadî ji di 3 sansen cuda yê festîvalê de hate nişandan ú ji hêla bîneran ve pêswazî lê hate kirin.

Di cîhana mûzîkê de herî zêde U2 qezenc dike



AMED (Pêşketin): Stranbêjên ku li gor mafén weşanê, turne, fîrotina cd ú stranan heri zêde qezenc bi dest dixin hate diyar kirin. Li gor vê lékolînê koma U2 bi 108 milyon dollarê bû yekemîn.

Her wiha 57 ú 47 milyon doları Bruce Springsteen ú Madonna ji bûn dûyemin ú sêyemin. Bi 43 milyon doları ji Britney Spears bû çaremin.

Pirtûka Arjen Arî 'Bîhoka piş sinor' derket

AMED (Pêşketin): Her roj pirtûkeke nû ya bi kurdî li refîkên pirtûkxaneyen zêde dibe, vê carê ji, pirtûka çirok-serhatî ya Arjen Arî di nav refikan de cih girt. Pirtûka Arjen Arî 'Bîhoka piş sinor' ji 120 rûpelan durist dibe ú tê de ji kaniya kelepora kurdî bigire heta bi serhatîyên Arî, bi zimanekî nermî i rewan hatiye honandin, ji Weşanxaneya Avestayê ku li bajarê İstanbulê weşanên xwe bi kurdî-tirkî dike, derket. Berpirsên weşanxaneyê di beşa nasandina pirtûkê de bal kişandiye ser ziman ú şewaza Arî ú cih daye van gotinan: "Dirêj an ji kurt, her ji yin li dev xwediyê xwe xwediyê xwe ú çirokekê ye. Dikeki min hebû ku her sihar bi hilatina spêdeyê re li hewşê dikir qûqû... qûû, ú pireke min, ku her êvar ji serboriya xwe ya té karesat qetek jê bi çiroki vedigot! Her ku min li çiroka pirê guh didéra, li bendi bûm ku ne çiroka xwe, çiroka Diko vebêjê ji min re... Lê wê; heçku bixwaze min ji bike şirîkê serboriyê xwe, hercar guhkê buxçika eşâ xwe bi vê peyvê vedikir: Xwedê heqê me nehêle, kurrê min... Ji ber heq ú neheqiyê bû gelo, min ji çiroka Diko ú Pîrê hez dikir?"

-Arjen Arî

Sala 1956'an li herêma Omeriya, li gundê Çalê hatiye dînyayê. Di sala 1970'an de Enstituya Perwerdeyi ya Diyarbekirê Beşa Zimanê Tirkî qedan.

Berhemê Arjen Arî ev in:

Ramûsan min veşartin li geliyekî, Şî'r, Avesta,, 2000

Ev çiya rûspî ne, Şî'r, Avesta, 2002

Destana Kawa, Şî'r, Weşanên Elma, 2003

Erouтика, Şî'r, Weşanên Lis, 2006

Bakûrê Helbestê/Antolojiya Helbesta Bakûr, WŞ.Y.N.Kurd, Duhok, 2007

Çil Çarın, Şî'r, WŞ.ENS.Kurdî ya Amedé, 2008

Sérgele, Şî'r, Avesta, 2008

Ji bo pêşarojê texmînên herî "şas"

AMED (Pêşketin): Di dirokê gellek kesên têgiheşti gellek texminên ne rast ji kirin e.

Ji wana çend minak;

"Pêşeroja radyoyê nîne"
Lord Kevin - Zanyarê Fizikê

"Êdi tu tiştê ku were îcad kirin nema"
Charles H. Duell - Serokê Enstituya Patentê ya Emerika (1899)

"Otomobil heweseke demîye, wê hesp her tim were bikaranîn"

Midureke benqayê ku li hemberî daxwaza krediyê ya Henry Ford gotiye

"Balafir pêleystokên xweşin lê tu giringiya wan ên leşkerî nîne"

Mareşal Ferdinand Foch, Di dema şerê cihanê a yekemin de Serfermnadarê arteşa Frensayê (1911)

"Televîzyon herî dereng dê di nava 6 mehan de ji holê rabin"

Daryik F. Zanuck - Serokê Twenty Century Fox (1944)

"Giraniya kompîteran dibe ku di pêşarojê de tenê 1,5 ton be"

Kovara Popular Mechanics - (1949)

"Ez sedemek nabînim ku mirov kompîteran bigrin mala xwe."

Kenneth Olsen, Serokê şirketa kompîterê a Digital Equipment Corp.ê (1977).



Riyên Dêrikê tên çekirin

MÊRDÎN: Şaredariya Dêrikê di çarçoveya xebatén xwe de, dest bi xebatén çekirina riyan kir û hemû riyan Dêrikê dê bi kevirên parke bén raxistin.

Şaredariya Dêrikê ya Mêrdînê di serê salê starta xebatén xwe yê dema nû dan.

Di bernamaya xebaté gelek faliyet cih digirin. Bername bê nauber didome.

Di çarçoveya bernamaya xebaté de herî dawî li taxên weki Cevizpinar û Kuçukpinarê xebatén raxistina riyan hate dest pé kirin.

Şaredara Dêrikê Çaglar Demirel der barê xebatê de nérinên xwe anin ziman û diyar kir ku pirsigrékên sereke yén navçeyê yén weki av, rê, binesazi û her wekê din xebatén wan bê navber dimeşin û got ku dê isal giraniyê zédetir bidin ser van xebatan.

Demirel di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Me li 8 taxan bi gel re civin pêk anin.

Di encama civinana de me dest bi xebatén xwe kirin. Di bi sertên zehmet de me bi piştgiriya gelê xwe re xebatén xwe meşandin û dê di demeke néz de bi dawî bibin."

Melhemâ parastina destan

Kevçiyek rûnê behivan, zerdikên du hêkan, kevçiyeki şeranî kil. Malzemeyan heta kû bibin mina melhemê tev bidin. Di sarkerê de bîhelin.

Her ku lazim bû, di desten xwe bidin. Melhem, wê cildê destê we piparêze.



EGER TU KURD İ...

Ô TU NAXWAZİ BİNGEST BİMINİ, TU NAXWAZİ ZIMANË KURDİ Ô MILLETË KURDUTUNE BİBİ...

BI DAXWAZNAMEYAN, BI MEŞAN, BI BOYKOTAN, BI ÇALAKİYAN, BI NEÇÜNA DIBISTAN Ô KARGEHÊ, BI DOZ VEKIRİNÉ...

PERWERDEYA BI KURDİ BIXWAZE!

Jİ BO REKLAM Ü İLANÊN WE

Hün dikarin di Pêşketin, HAWAR.NET.com an jî weşanên din ên koma HAWAR de reklam ü ilanên xwe bi nixxa herî gûncaw biweşînin.

têkîlî agahi@hawarnet.com



Derdê rojnamevanan memikên jina Sarkozy ye

Xanima yekemin ya Fransa Carla her mehê çend caran skandalekê derdixîne û cihana magazinê bi xwe re mijûl dike

Sarkozy ku xwe fêri wan skandalan kiriye, ji ber vê yekê serê xwe qet bi wan nûçeyan re naşine. Berî demekê sûretén wê yên erotik di medyayê de bûne manşêt. Skandala dawiyê ji memikên wi bûn. Di civineke xwarinê de ku li ser şerefa serokê Rusya Medvedev hatibû dayin, jina Sarkozy Carla Bruni, sutyen li xwe nekirin.

Lixwenekirina sutyenê di heman rojê de, di bultenên nûçeyan de bûne manşêt. Bruni kincen teng li xwe kiribûn, ji ber ku sutyen li wê tune bûn, memikên wê di bin kincen teng de xuya dikirin. Ev dimen bala peyamnê û fotografan dikişine, li ser vê yekê yek ji mezintirin rojnameyên inglez Times pirs kir: „Lazim bû ku Bruni sutyen li xwekiriba?“ Rûdaw

Raxisteka UEFA'yê 10 hezar kes gerî

AMED (Pêşketin): Di çarçoveya projeyên Paytexta Kulturê yê Ewropayê yê Sala 2010'ê ya İstanbulê Raxisteka Futbolê bi navê "Only a Game" ya UEFA'yê (Union of European Football Associations - Yekitiya Federasyonên Futbolê yê Ewropayê) ji hêla 10 hezar kesan ve hate ziyaretkirin. Raxistek heta 30'ê Avrîla 2010'ê li Galeriya Hunerê ya Komarê ya Taksimê wê vekiri bimîne û di çarçoveya raxistekê de Kupaya Ewropayê û Kupaya Serkeftiyen Kupayê ya UEFA'yê

ji tê nîşan dayin û bîranînê 50 salên dawî tên ber futbolhezan. Raxistek di meha reşemiyê de bi hevkariya Şaredariya İstanbulê û Federasyona Futbolê ya Tirkîyeyê hate vekirin û raxistekê de parçeyên taybet ên Beşiktaş, Galatasaray û Fenerbahçeyê hene. Raxisteka Futbolê ya UEFA'yê ya bi navê "Only a Game - Tenê Listikek e" li gel ronahî kirina 50 salên futbolê centilmentiya futbolê ji dixwaze bide ciwanan û bo xwendekar û mamosteyan belaş e.

Hün dikarin di Pêşketin, HAWAR.NET.com an jî weşanên din ên koma HAWAR de reklam ü ilanên xwe bi nixxa herî gûncaw biweşînin.

têkîlî agahi@hawarnet.com